Mêldar û alîgirê hukumdar û dezgehê hukumî nîne, di fikir û helwestwergirtina xwe de azad û xwedî prensib e, bi istiqrâr e.

Bergehî fikir û derbirîna fikira rewşenbîrîye bi welat û civakekê re ne sînorkirî ye. Bi prensibine universal tevdigere. Digel vê xebata xwe ya berfireh, rewşenbîr bi zimanekî milî dînivise û di vê karê xwe de bê guman hewil dide da ku perspektîfeke şexsî biafrîne û li paş xwe şopeke welê bîhêle.

bin piyêne Tirkan de .

Ne tenê tirk bûn sebeba têkçuna doza azadiya Kurdistanê wê demê, naxêr..! Ne alîkariya gelek ji eşîr û axeyên Kurdistanê bi şoreşa Şêx Seîdê kal re û şoreşen paşî wê jî! Dîsan diyar dibe ku bi behaneyâ oladariyê Tirk dixwazin Kurdan bera pêxila hev bidin.

Loma li Cezîra Botan xaka Bedirxaniyan dixwazin ji bo çend jinekî ku serê xwe bi şerpak reş girê didin û mejiyê xwe tîjî fîkr û ramanê «Da'ış» kirine şer û pevçûnan derxin holê, da ku bêjin Kurd doza serxwebûn û cudabûn ji Tirkîye nakin.

Ez nizanim, heger ew kesen derketin xwepêşandanen li dijî şanoyekê ku çend çalakvan pê rabûbûn û kiryarên hovane yên «Da'ış» rexne kirine, çima li dijî kiryarên leşgerê Tirk li seranserî sînorê Rojavayê Kurdistanê dernakevin xwepêşandanen!!!

Yan jî çima ji bo parastina Misilmanan li Kobanê dernakevin xwepêşandanen û dozê li hikûmeta Osmaniye ñû nakin ku alîkaryen xwe jibo «Da'ış» rawestînin !!! Heger bi rastî Misilman in çima rîka pêxemberê Xweda Muhemed (S) nagrin û pişta hejar û mezûlûman nagrin û dest ji piştevîya zalim û

zordaran bernadin ???

Heger Misilmanî tenê mabe şerşefâ serê jinan, ez bawer im ev ne bû ol ev bû tiştekî din ez bi xwe nizanim bê ew tiş çî ye?!

Heger Musilman in çawa dikarin bê deng bîmîn li dijî serjîkîna mirovan bê tirs û fedî ?!

Heger Musilman in çawa doza mafê xwe nakin wek miletê cihanê??!

Heger xwedî ol in çima dixwazin bîmîn kole di bin destê Tirkan de!!! Ev ci ol e k mirovan kole bîhêle??!

Nûçeyên ku ji Cezîra Botan têr gelek pîrsan tînîn rojeyê, rewşa

Kurdan ji aliye kî de û ya siyaseta dewleta Tirk ji aliye kî din ve dixe guman û pîrsiyariyê de?

Cezîra Botan, wargeha Burca Belekû Bedirxaniye, Kurdistanî ye û keleha rewşenbîr û netewa Kurda ye, berî misilman bîn riwê dînyayê bi hezar salî, û di dema ola Misilmanîye de jî Cezîr bû ye yek ji navendê ol û zanista İslâmî û Kurdevarî ku bi saya vê nerîna berfireh û şaristanî ji ol û pîkvejîyanê re, Cezîra Botan bûye şarekî pir binav û deng, vêja wê çend jinekî serşerîfîr û mejî genî nikarîn vê şaristanîye têk bibin .

## Da'ış ji Ku Hat..?

Roj bi roj ramanê Marksî û projeya qata karker û cotkaran di holê de cîgirt û vî ramanê ñû mejiyê qada karker û cotkaran dagir kir. Lewra dîtin ku çareserî û rîzgarkirina ji bin destê dijminê kevnar nîne ne bi rîya Marksîyê bê. Nifşê ñû bi «sed hezaran» berê xwe dan vê ramanê ku ji hîlekî ve wek hîviyê û xwesîya jiyanâ mirov dixwaze û ji hîla û ve çarenûs û azadiya gelan dixwaze. Ramanê ñû yê ku di bin van siloganan de kat dida bû weka pelek ewîn gitre ezmanê hemî cîhanê. Ji ber wê yek ji yekî Kurd dikarî here Nîkaragwa tevli şoreşa Sandîn bibe yan jî here Vênamî li» Diyan biyan fo» tevli eniya rîzgarîxwaza Vênamî bibe û şerî Emerîka bike û di bin van siloganan de jî bi «sedî xorten kurdan berê xwe dane meydana herî gerim qada «Filestîn» ê. Şer li dijî cîhûyan û Impiriyalîya cîhanî kirin. Ûmînakalî berçavê meçawê Arnisto Tişî Gîvara ji Ercentînê berê xwe da Giwatîmala û di pey re çû Meksîkê, ji wir çû Koba yê û Kongo û dawî li Bolîviya yê bi destê Emerîka jiyanâ xwe ji dest da. Li rexê û şepêla nijadî li vir li deraha serê xwe rakir û bi dihan

eniyê çekdar daketin meydana nijadî. Xwediye û projeyê ew jî weke şanê di nav miletê xwe de ketin xebatek bê westan û li gelek deveran şer gerim bû lê piraniya wan jî ne dûrbûn ji ramanê Marksî lê di bin navê tevergân rîzgarîxwazê netewî. Di cîhana Erebî de Cemal Ebdul Nasir bû simbola nijadiya Erebî ramanê partiya Nasirî li piraniya welatên Ereban serî hilda û di pey re partiya Elbes ji Sûrî û Îraqê dest pêkir û xwest cihê Nasir û partiya wî bigre, û ew ramanê Beşîyan biserker di nav çend welatên ereban de..

Lê di dawîya sedê bîstan û despêka sedê bîst û yekan de ev herdû projek têk çûn û nekarîn wan sozê ku ji qada karker û cotkaran re dabûn ku wê jiyanek aram û welatên bi ewlehî û wekhevî û sosyalist pak bikin, û ji hîla din ve jî şepêla nijadî nikarîbûn welatê xwe pêş bixin û hemî xwestekê milet pêk bînîn û nejî zikê birçî têr bikin. Bi têkçuna ramanê Marksîyê re li gelek welatân ku ew desthilatdar bûn bêyî dile xwe dev ji desthilatdariyê berdan û li rexê û şepêla nijadixwaz

hîviyîn milet bi cî nanîn. Li vir piraniya milet bê hîvi bûn weka pezê bê şivan ji hev belav bûn ji ber ku ew herdû ezmûn li ber çavê wan têkçûn û tiştek ji wê zola hîviyîn xwe bi wan projeya anîbûn têrê nekirin. Ew zolê berfere man bê rînas û hemî hîviyîn wan jî li ber bayê Marksîyê û nijadiyan çûn. Bûgoman wê ew zola fereh ji milet ji xwe re li çareserîkî bigerin wek ku kesek bikeve avê û destê xwe li qrişka bipeline. Dema ku tovê projeyâ olê li vê zemîna beyar reşandin zûn bûn ji ber ku zimînek tîbû û milet bê hîvi bû û hîviyîn xwe di olê de dîtin ku ne wan bike yek û hîviyîn wan bi cî bîne kes nikare. Ji ber ku her kes dikare ciyê xwe di olê de bîbîne, ji Çaçanistan ta bi Erebistan.

«Da'ış» li çûna van herdû ezmûnan şîn hat û hîdî hîdi şax veda û bû ciyê bawerîyê li cem Cîhana Misilmanan ji ber wan dît ku ola pêxember bihitir ji Marksîyê ji wê bi kîrî wan were çimkî Xweda wan dîghîne hev û nexasim Misilmanê «Sine» ku di bin pêstûriya «Şîea» û Ecînd Emerîka û Europê de ne !!!

xwepêşandanen millet, û çalekiyê çedîbûn, bi awayekî aramî, û aştiyane destpê kir, û çihekî pîrozî wergirit, li nik şoresî, bûhara erebî xwedîgiravî. gelên cîhanê jîr piştgirî kirin, ji bo damîrandina welatêkî, yasayı, weletekî bi binyada wekhevîyên civakî, û abûrî ava bîbî, avakîrina civakek xwedî bawer, bi mafêni mirovan, biratiya gelan re ye, hevjinâ netewan re ye, û hemî rîngê çandê, ji ber civaka sûrî, heme-rengê, mîna tabloyeka, bi nîgarê pînc û kaşî hatîya afrandin, bi destê dîrokek hem-demî.

lê mixabin, ji ber hin sedem in dijwar, bû şoreşek leşkerî, û gelek hîzîn çekdar tundirew û çete ketin nav de, di bawerîya min de şoresî ji ber van xalan hat guherîn: -<sup>1</sup> Pêdçûna rejîmê di zordariya gelên xwe de, û mejiyê jengerî ji ramanê ezyî û tenhayî û ravajtina hemû berên awlehiyê di siyaseta perçiqandin û navnoyîa miletê xwe yê hejar de.

<sup>1</sup> - Kuştarên hovîti bi destê leşker û endamên ewlehîyên ve, û amadikirina biriyarîn bi qirkirina sedan endamên hevrîkî ji bilî dîlkirina hezaran kesen çalakvanê hevrîzên şoreşê amanc ew e vemirandina şoreşê.

<sup>2</sup> - Kuştina bê sîc û standina biriyarîn leşkerî di derheqê leşkerîn yên ku ne razibûna xwe didan li hember biriyarîn leşkerî ji aliye fermandaran.

<sup>3</sup> - Xwediye û şoreşek leşkerî, û gelek hîzîn çekdar tundirew û çete ketin nav de, di bawerîya min de şoresî ji ber van xalan hat guherîn:

<sup>4</sup> - Dîxwazin Tirk-rolek bi bandor li rojhîlatawa rast ji xwe re biçespîn, mebest jê ew e rola xwe bi layê erebî û İslâmî re serrast bikin.

<sup>5</sup> - Ji hin sideman yek ji wan û ev ya herî serekeya xwesteke Tirkya li gel yekîtiya oropîya neçûserî û siyaseta wê wer bû. û sedema düyem ew e nerîna Tirk ab dîrokî misilmanî wê bihtîrîn ji wan re alîkar be dibînîn şewekeyî pirr hesane pê mafêni gelan daqurtînîn û nanî hejaran li tenure xwe bixin, dîxwazin bi vícekî her hêza kurdî sist bikin û ji hev bixin, loma xap û davan divedin da kurd li hev xînîn, û dirhîn nakokiyê di nav wan de çekîn, loma herdem siyaseten hevdij dajon.

<sup>6</sup> - Dîxwazin Tirk-rolek bi bandor li rojhîlatawa rast ji xwe re biçespîn, mebest jê ew e rola xwe bi layê erebî û İslâmî re serrast bikin.

<sup>7</sup> - Dîxwazin Tirk-rolek bi bandor li rojhîlatawa rast ji xwe re biçespîn, mebest jê ew e rola xwe bi layê erebî û İslâmî re serrast bikin.

<sup>8</sup> - Dîxwazin Tirk-rolek bi bandor li rojhîlatawa rast ji xwe re biçespîn, mebest jê ew e rola xwe bi layê erebî û İslâmî re serrast bikin.

<sup>9</sup> - Dîxwazin Tirk-rolek bi bandor li rojhîlatawa rast ji xwe re biçespîn, mebest jê ew e rola xwe bi layê erebî û İslâmî re serrast bikin.

<sup>10</sup> - Dîxwazin Tirk-rolek bi bandor li rojhîlatawa rast ji xwe re biçespîn, mebest jê ew e rola xwe bi layê erebî û İslâmî re serrast bikin.

## Tevgera şoreşgerî



Gulal Kasanî

navbera wan de hat hîrivandin. ji ber wiha ji pirsek dice gelô? OXLO ci ji rejîma Sûrî dixwest, azadiya gelê Sûrî wekhevî çespanâna mafê kurdan di destûra Sûrî de?

yet ji van xalan li ba rejîma Turk tuneye û ne dilxwazê ku piersgirêka kurdî bi rengekî fermî û awayekî sîvîl, çareser bike.

Dêmek turk ci dikan, ji wan re bobelde heger nekin poşman dibin, heger bikin, car di poşman dibin.

Li gel guherîn û şoreş SÛRÎ kirin, car di bi leppa li riwê xwe dixin, dikevin hev matmayî gelek cara dimîn.

mînak rûdawîn li Serê Kaniyê û di vê dema dawî de li Kobanê keliha mîranîye:

Ji ber van xalan Tirk di bawerîyen xweyi siyasi de têk diçin:

-<sup>1</sup> - Xwendîna wan li ser cîwarê cîwpoltîk tim şas ja ji ber nerînê wan teng in ji pozên xwe pê ve nabînî li gor berjewendiyen xweyi netewperestî dixebeitin di bin sîwana OSMENLÎ de, gelek cara dibin şalikê ola İslâmî de nêçîrenî di ava gerav de dikin bi hisekî leşkerî pîrsa qutber dikin.

-<sup>2</sup> - Nerîna ci qîr li ser netwa kurdî û hîzîn wê poloşîk û pêşeng metîrsiya ji pîrsa kurdî û bawriya zikreşî û bi kîn li ser xaka pîroz (Kurdistan).

-<sup>3</sup> - Mebesta Tirkan ew e ku kurd li ser tîxubî wê yê cîgrîfî nebin xwedî hîzîn bîrîyar û avakîrina sistemek netewî

-<sup>4</sup> - Dîxwazin Tirk-rolek bi bandor li rojhîlatawa rast ji xwe re biçespîn, mebest jê ew e rola xwe bi layê erebî û İslâmî re serrast bikin.

Ji hin sideman yek ji wan û ev ya herî serekeya xwesteke Tirkya li gel yekîtiya oropîya neçûserî û siyaseta wê wer bû. û sedema düyem ew e nerîna Tirk ab dîrokî misilmanî wê bihtîrîn ji wan re alîkar be dibînîn şewekeyî pirr hesane pê mafêni gelan daqurtînîn û nanî hejaran li tenure xwe bixin, dîxwazin bi vícekî her hêza kurdî sist bikin û ji hev bixin, loma xap û davan divedin da kurd li hev xînîn, û dirhîn nakokiyê di nav wan de çekîn, loma herdem siyaseten hevdij dajon.

# Hevpeyvînek Taybet Bi Navdartirîn Mozîkjenê Kurd re Mihemed Elî Şakir



- Helbest divê ku berî her tiştî hestên xwêneran û guhdaran bihejîne û mirovatiya mirov bilindtir bike.
- Ez ji malbatek dengxweş im. Bapîrê min pêsewayê mazgeftê bû, û bavê min jî dengê wî xweş bû.
- Heta niha min ٢٠٠٠ helbestên xwe awaz kirine
- Temenê min deh sal bûn, min dixwest ez tiştekî bikim, li amûreke mozîkê bixim, bavê min ket ser riya Helebê, min jê xwest ku ew ji min re bilûrekê bîne.
- Me bi xerciya xwendina xwe Ûd ji mamosteyekî kirî, û dîsa jî me nizanîbû ka em çawa deng ji wê bînin.
- Ûd amûreyek Kurdî ye, em ji wê re dibêjin Berbet.
- Min helbest û awaz li ser kasêtan tomar dikirin û dişandin Beyrûtê ku Mehmûd û koma xwe wan stranan pêşkêşî cemawerên Kurd bikin .
- Ez hez dikim ku gelek ji miletê me xwe di warê helbestê de bibînin lê tiştek heye, bila her tiştî çap nekin

**Hevpeyvîn Xweşnav Heso**

-Di destpêkê de Mihemed Elî Şakir kî ye?

-Navê min Mihemed Elî Şakir e, ez li bajarê Dirbêsiyê sala ١٩٤٦an hatime dinê, ji malbatek dengxweş im. Bapîrê min pêsewayê mazgeftê bû li gund, û bavê min jî dengê wî xweş bû.

Despêka we di nivîsandina helbestê û awazkirina wan helbestan de bû?

Ez ji zarotiya xwe ve girêdayî awazê bûm û min zêde ji müzika Kurdî hez dikir, di tara me de radyo ligel cînarekî me hebû, her roja çarşemê di hefteyê de, em diçûn wê malê bo li radyo guhdar bikin, di wê gavê de pirogramek derdiket bi navê Pişka guhdaran, ev program stranê Kurdi diweşandin wek stranê M. Arifê Cezîri-Hesen Cezîri û Kawîs Axa, û ji bilî radyo ji li bajarê Dirbêsiyê Omerî hebûn ku bi rojên dirêj aheng lidar dixistin, û dîlan dihatin çêkirin, helbet stranê wan ên Kurdi bûn û bi resenî xweş digotin, ji wan dengbêjîn» Omerî» û radiyoya cînarê xwe hezkirina awaz û gotinê Kurdi di dilê min de şîn hat. We çawe despê kir?

Temenê min deh sal bûn, min dixwest ez tiştekî bikim, li amûreke mozîkê bixim, bavê min ket ser riya Helebê, min jê xwest ku ew ji min re bilûrekê bîne. Bilûr peyda bû, û bêguman kesek li dora me tune bû ku min fêr bike çawa ez deng ji wê bînim, hin bi hin min û birayê xwe Mehmûd Ezîz Şakir me xwe fêrî bilûrê kir û êdî em baş fêrî bilûrê bûn û di dibistanê de me ji mamosteyan re stranê xwe bi bilûrê digotin, kîfa wan dihat û kîfa şagirtan ji dihat.

Pişî bi demekê me xwest

ku em amûreyek din peyda bikin, ji ber ku bilûr ne alîkar e ku em sitranan jî bi awazan re bibêjîn, ji vê yekê jî me ûdek bidest xist û me bi xerciyê xwendina xwe ûd ji mamosteyekî kirî, û dîsa jî me nizanîbû ka em çawa deng ji wê bînin, û ne jî em bi ci awayî deng tûj bikin û kok bikin, roj bi roj em fêr bûn li ser dûzanê û deng jêderxistinê.

Sedema hilbijartina we ji ûdê re?

Em neçar bûn li ser vê hilbijartinê, ji ber ku amûrên mozîkê wî heyemî pir kêm bûn, û kêm kes hebûn ku amûre ligel wan peyda dibûn, li gorî lihevhatinê bû ev amûre, û belê ûd amûreyek Kurdi ye, em ji wê re dibêjin Berbet.

Baş e, te û mamoste Mehmûd Ezîz pişt re we çawa berdewam kir?

Di sala ١٩٦٩an de ez bûm leşker û min berê xwe da leşkeriya neçar, û Mehmûd jî berê xwe da Libnanê, Mehmûd li li Beyrûtê komek mûzîkê ava kir û min jî helbest û awaz li ser kasêtan tomar dikirin û dişandin Beyrûtê ku Mehmûd û koma xwe wan stranan pêşkêşî cemawerên kurd bikin.

Û pişî bidawîkirina leşkeriyê ez hatim SerêKaniyê û êdî ez bûm mamosteyê dibistanê, li bajarê SerêKaniyê min mamosta Yûsif Berazî «Bê Buhar» nas kir, vêca di wê nasînê de hin helbest dan min ku min awazên wan ava kirin wek stranê «Eman Dilo, Gulîzar, Hebs û Zindan»

Birayê min Mehmûd Ezîz ew stran ezber dikirin û çû êzgeha Bexdayê sê stranê pêşî tomar kirin ew jî ev bûn» Şîn bû rîhan, Gulîzarê, Canê». We çiqaş Helbest awaz kirine?

Heta niha min ٢٠٠٠ helbestên xwe min awaz kirine, û ٢٠٠٠ awazên min hene ew ji yê helbestvanê navdar bûn wek: Bêbuhar, Osman Sebrî,

Seydayê Tîrêj. Û hîn jî ez li Serêkaniyê me û karê xwe dikim.

Hunermendênu ku helbest û awazên we gotine?

Para şer ji helbest û stranê min gihane birayê min Mehmûd Ezîz, û hin jî min bi dengê xwe gotine, û gihane Mihemed Şêxo, Şêrvana Kurdi, û gelek hunermendênu jî gotine.

Wek helbestvan we çawe xwe nas kir?

Di dema leşkeriyê û ji ber dûrketina min ji malbatê û ji amûreya xwe «ûd» min dest bi nivîsandina helbestê kir, û pişî vegera min li SerêKaniyê helbestvanê gewre seydayê Bêbuhar alîkarî bi min re kir di ristina helbesta Kurdi de, û min sûd ji gelek helbestvanan kir ew hemû bo min mamoste bûn.

Hevbeşiya hunerî ya te û birayê te Mehmûd Ezîz Şakir tu çawa wê dinirxîne?

Belkî ji perwerda malbatî bû, û belkî ji ber ku ez wî hevçax û hevkar bûn ku me ji destpêkê de bi hev re gavê xwe yênek avêt, guman tune ye min û wî gelekî ji hevdû sûde kir, min baş ji wî sûde kir û herweha wî jî helbest û awazên min bi dengê xwe yêzelal dikirin stran û tomar dikirin.

Niha hûn rewşa mozîk û strana kurdi çawe dinirxîn?

Sînor ji hunerî re tune ye, ew her veguhêze û ji qonaxekê ta ya din xwe rengîn dike, lewra jî ez dibînim ku mozika Kurdi roj bi roj gavan davêje ber bi pêş ve, ez dikarim bibêjim ku awaz û mozika kurdi û birastî jî awazên Kurdi ez dikarim bêjim ku ew xwe nû dike û bervî pêşvebirinê dice.

Di tomarkirina stranê te yên pêşî li tomargeha Bexda û Beyrûtê, gelo tu jî amade dibû?

Nexêr..! Ez nedîcûm tenê mamoste Mehmûd diçû ji bo

tomara wan stran, pêşî li Bexdê bû û pişî ku alozî kete rewşa Iraqê de me tomargehê Beyrûtê pijrand, hêjâyî gotinê ye ku wê dema tomarkirinê ez bi dibistanan mijûl bûm yan jî

ez leşker bûm. Gelo rast e ku M.E.Şakir, pêşî awazan çêdike û paşê gotinan jî re dinvîse?

Belê rast e! Ji ber ku bêtir ez xwe dibînim wek awazsaz bêtir ji helbestvan, pêşiyê ez nota datînim û belav dikim û dûr e ez gotinan li ser bingeha wê awazê peyda dikim.

Helbesta te ya yekem tê bîra te kîjan bû, û te çawa ew helbest nivîsand?

Belê, helbesta min a yekem binavê «Zeynebê» bû, û di destpêkê de ew gelekî dirust bû, ji wê yekê min alîkariya mamoste Yûsif Berazî «BêBuhar» xwest. Birastî ew Helbest destpêk bû û ez ked û şîretên «Bêbuhar» jibîr nakim ji vê hêlê ve, pişî helbesta «Zeynebê» min helbesta «Ez Keçîka Kurdi me» û «Gulçînê» jî nivîsand, û di wan de jî Bêbuhar alîkariya min kir, ta ku ez gihiştîm astek xurt û êdî şâşî û kêmâsi bi min re nema derbas dibûn di ristina helbestan de.

Di warê stran de, ci stran bêtir riya we di hunerê de vekir, kîjan stran bêtir we wek navdar pêşkêş kir?

Birastî ew strana «Gulîzarê» bû, Şîn bû rîhan, Eman Dilo û Hebs û zindan jî, ev stran ew in ên pêşî bûn ku me di riya wan de riya xwe girt, û helbest ji gotin û awazên «Bêbuhar» bûn ev stiran.

Helbest di nerîna Mihemed E.Şakir de, çawa tê nas kirin?

Helbest berî her tiştî dive ku bi hestên mirov xwe nîşan bike, eger helbest bi hestên guhdaran nelîze û bilind neke ew û ne helbest be bêguman!, helbest divê ku ne gelekî girtî be û dûr be ji jiyanî mirov, gerek êşa miletan bibêje, gelek kes dinivîsin û xwe dibînin wek ristevan-helbestvan, lê tenê xwêner biryare distînîn ku kî helbestvan e û kî ne helbestvan e!

Û gelek caran çêbû ye ku her kes xwe bibîne di warê helbestê de, xwezî ew birastî wisa bana, lê mixabin pir hene ku ji nû fêrî nivîsîna Kurdi bûne û xwe diyar dîkin wek

xwedanê destaneyan û dîwanê helbestî. Birastî jî ez hez dikim ku gelek ji miletê me xwe di warê helbest û tîstek heye, bila her tiştî çap nekin, ji ber ku ne her tişt were nivîsand ew ê bête belavkirin û çapkirin, disa jî ez dîbîn i m helbest divê ku berî her tiştî hestên xwêneran û guhdaran bihejîne û mirovatiya mirov bilind tir bike.

gastînê de dibîne, helbest, awaz, şêwekarî, xweşnîvîsî, yan dengbêjî?

Xweşnîvîsî û şêwekarî behre ne, û dengbêjî ji xwe tiştekî xweş e, û helbest û awaz jiyanî min in tevê vê jî bêtir ez xwe di awazan de dibînim.


M.E.Şakir ci karê nû dike? Ev demeke ku ez xwe di rîzimana Kurdi de pêş dixim, li ser ziman ez dixwînim û xwe li pêş dixim.

Mamoste tu rojnameya «Buyerpress» çawa dinirxîne?

Birastî ev çend hejmar dighêje destê min ji vê rojnameya ceywaz, ez dikarim bibêjim ku ew yekem rojnameya serbixwe ku dibînim, û cûrbicûr e, gelek quncikêñ balkêş tê de peyda dibin, û bi herdû zimanen tê çapkirin, ez serkeftinê ji we re dixwazim û hêvî dikim ku Bûyer her û her bimîne bo ragihandinek zelal.

Di dawiyê de ji xwendevanan re tu ci dibêjî?

- Ez daxwaza serkeftina bêdawî ji teva re dixwazim, hêvîdar im ku rojên pêş ew ê xweştir be di welatekî hêmen û azad, û sipasiya we dikim li ser vê hevpeyvînê û hêvîdar im ku hûn her û her li pêşbin û bi vî rengê ceywaz û zelal berdewam bimînin.



# Dawîya Piyalê

Hekîm Ehmed

Dûr bin ji bend û berberî em tevde bûn kom û kerî  
Îro tenê em bê serî dijmin li me girtin derî  
Bi dest me naxin koçerî dibêne bere Kurd hey  
herî.....

Ji (Zeviyek Gazîdan) a mele Nûriyê Hesarî,  
helbesta: (Divê Kurd bibin yek).

(Dûr bin ji bend û berberî): Kesekî Kurd nemaye ku ev hevok negoziye, dîsan, her qonaxeke nû bendan pirtir dike û asta berberiyê bilindir dibe, helbesteanê me jî dibêje: jê dûr bin. Lêkera (bin = bibin) fermanî ye, lê radije wateya haypêdanê, weke ku ji zarokan re bêje dûrî agir bin, bive ye. Pişti vê daxwaza bi êş, Mele Nûri rewşa heyî berçav dike (em tevde bûn kom û kerî), tevde bê awarte, lêkera bûnê jî li vir ji bo guhertinê hatiye, ango em ne ji kokê de wiha ne, mixabin em bûn, kom û kerî ne hevwate ne û zelal e ku kerî xirabtir e ji kom. (Îro tenê em bê serî): Hevoka pêşî ya çaresiyê dixwaze ji guhdîr re bû (win), ya duyem û sêyem ku aloziyê destnîşan dike bi zimanê peyvok e (em), ango helbestean jî weke hemû Kurdan xwe dibîne beşek ji pirsgirêkê, xwe qurbanî dibîne, lê dema çare tê xwestin ew berê xwe dide yên dora xwe, ji aliye kî din ve, sazkirina vê hevokê bi hostayî hatiye ku peyvan û terazîyê bi hev re parçeyen müzîkê ava bikin, di encamê de dengek xweş tê guh (Îro/tenê/em bê/serî). (Dijmin li me girtin derî): Hîna

jî helbestean bi navê gelê qurban ê kom û kerî daxive, helbet wê dijmin li gor neyariya xwe bike, tevî ku ew dijmin di vê hevokê de gelekjimar e, lê dikarin karekî hevbes bikin (girtin), berevajî kom û keriyên bê serî.

(Bi dest me naxin koçerî): Wê kesek matmayî nemîne ku dijmin mafîn biçûk jî bi dest bindesten xwe nexe, ji ber wê em têdigin ku di vê hevokê de Mele Nûri weke hemû helbesevanen me yên berê hişyariyê dike, ev pêwistiyekê dema nezaniyê bû, lê wê nexwes be ku helbesteanekî niha bi vê yekseriyê ji xelkê re tiştên zelal zelal bike.

(Dibêne bere Kurd hey herî): Ewê nerazî bin bi rewşa kom û kerî tenê, ya ku dixwazin Kurd herî, wenda bibî, nemîne, tiştê balkêş peyva (Kurd) li vir yekjimar e, ne win in, ne em in, lê Kurd e, yek e, mixabin weke di hevokê de hatiye ew tenê di nerîna dijmin de yek in. Di vê bend û berberiyê de, emê bi hesreta Mele Nûriyê Hesarî ji heman helbeste bi dawî bikin:

**Hey wax li xortê çavbelek  
dijmin li dor wan bû xelek.**



## Min Kalek Dît

Gavine çiyâyi tavetin  
Bi ciwaniya xwe re dipeyivî  
Pişta wî teviya bû  
Lê bi hilgirtina rext û tifingê ew  
piş rast dibû  
Temenê di salan de çûyî  
Axa çiyayê nemir diraxist  
Û pala xwe dida latê ker  
Di dîtina pêşî de tu dibê ev kalekî  
bê çare ye  
Lê ew hêrseke bê tirs e  
Ew hêzeke bê dawî ye  
Mina exterekî ji heft ezmana bi  
zemîn dikenê  
Ewî kalî çîroka mîraniyê dirûkîr  
Ewî kalî finda jiyanê pêxistibû  
Berî ku Edîson ronahiyê bibînê  
Ewî kalî dîroka min û te di  
malzaroka dayikê de firşik kiribû  
Mîna xîfşa xezalê ku li ber dilê  
dirindeyan nêçireke ewqa şérîn e  
Vî kalî pêvajoya şer û aştiyê jev  
cuda ne kiriye  
Jiber ku ew pêşmerge ye  
Pêşmerge qurbaniyê azadiyê ye  
Pêşmerge daramê rastiyê ye  
Perwîn û kîwan e di çerxa  
Pêxemberan de  
Pêşmerge padîşahê şetrenca  
mîran e  
Balyozê mirovatiyê ye.  
Min xwest jê bipirsim  
Lê wî serê xwe hejand  
Û ken dinav lêvîn wî de dîlan  
dikir  
Qermîçonkê demê bi kenê wî re  
winda dibûn



## Hêsîrê Bejnê

Lêvîn wî lev diterpilîn  
Tipen peyvan pey min diketin  
Û ji min re naveroka evînê şirove  
dikirn  
Evîna welat  
Evîna çek û têkoşînê  
Evîna aştiyê di gurbûna şer de.  
Min nema xwe girit û jê pîrsî:  
Mamo! Tê ci bikê û barê te temen  
e ?  
Qey tu ne rawestiya ye?  
Bi ser wî kenê nazik de  
Tîrêjine awiran tûj bi ser min de  
hatin  
Û dîse lêvîn lîzî peyivîn  
Lawo! Ji ber ku ez pêşmerge me  
Pêşmerge narawestê ta peşkek  
xwîn hebê  
Ew qurbanê welat e  
Pêşmerge şûrê bindestn e  
Pênuşa filozof û hêjayan e  
Pêşmerge jiyan e di gorê mirinê  
de  
Pêşmerge mirin e dema ku mirin  
qedexe bê  
Pêşmerge pêşmerge ye dema ku  
doza mîletê xwe pêk bênenê  
Û iro welat bangewaziyê dike  
Kerkûk hewar dike  
Ev Kurdistan e  
Ev dayika hejaran e  
Ev welat e.  
Pêşmergefî erkê min û te ye  
Îro geysa û kevir pêşmege ne  
Îro ax bi axîna pêşmerge ye  
Îro dem dema pêşmergetiyê ye  
Îro dem dema serxwebûnê ye  
wê bigota ez Xwedê me



**Belevkirin û şirovekirin:  
Salihê Heydo**

Ev sirûd ji bo zarkon tê gotin û bi naveroka xwe têr û tije ye, ji aliye avakirina xwe jî pir sayık û lihevhâfî ye û ji aliye kîş, rîzbend, movik, kît, û awaza xwe ve jî pir li pêş e. Cawa tê zanînê zarok pir ji vê sirûdê hez dikin û kîfa wan pir pê re tê, lewra naveroka wê li ser dîkêkî ye ku ew dîk pir sipehî û bedew û xurt û gernaze ye. Çêl û pesnê vî dîkî bi her awayî tê dane, geh bi mîran û xurtbûnê, geh bi bedwebûnê û çelengîyê, geh jî bi jîhâsibûn û xweparestanê, û ji aliye kî ditir ve bi xwedênasî û ayînê ve tê girêdan, û ya balkêş gundî û cotkaran gurîxî kar û xebatê dike, lewra dîk pir di folkorê Kurdan de cihê herî pîroz û layiq destine, loma em dibînin li devera Mawet Başûrê Kurdistanê parêzgeha Silêmanîyê şeniyê wê deverê goşte dîkan naxun, dibêjin ku heram û guneh e, çîmkî dîk di efsaneyen wan de ew ji kuştin û qîrkînê parastine di demen dûr û dêrîn de, dema ku êrşek di nîvê sevê de hafye ser wan û dîk bang daye ew ji xew rakirine û rabûne berevanî ya xwe kireye heyânî ku dijminê

**Nenik: Tişkîn ser kumikê**  
**Koçek: Neynoka di paş ling de**  
**Lepaz: Tilî û nehperûşkîn ling**



## Vedenga Bangê

Banga te giha dilê min  
Û li zozanê dilînîya vedeng da  
Dengê totak û goyîna  
Bi nafîna hevdîtinê  
Dirêjîya şevê didêran .....

Sev bê hîv bû  
Û ji ewrê xemgînîya  
Birûskîn azar û kovana  
dirjiyan .....

Kul û derda dil digezîn  
Û li ber pêlîn xulmaşîyê  
Min rîsê keser û xweziyan  
Dispartin devê kérân .....

Binkirasê elendê tenik bû  
Li buhara civanê me  
Û nikîlokê tilî yê min kewnî  
birçî  
Li gelî yê sînga te diçêriyan .....

Hingorê bi sarî û sorîya xwe  
Em dorpeçkirin  
Li biyabanê xewna  
Du kevokên kovî li hev  
baniyan .....

Û nermîya bayê sibehan  
Dengê me  
Bi dildarî li hev vedigêran .....

## Ji Kobanê



**Demhat Dêrkî**


Ji Kobanê va roj da  
tîrêj avêt dil û cavâ  
dil bûne yek ji cana  
dest bûn xaka evîna.  
Bû çem herkî li nava  
hesreta bi sedê sala  
gul û sosin bûn rûya

bûne kenê li ser lêva.  
Kobanê dengê xwe da  
dermanê birîna çaxa  
bûyî keskesora Kurda  
roja te li cîhanê veda.  
**Alfebeya jînê**  
Jina Kurd afirand dîrok  
nîvîsand alfebeya jînê,  
rûpel rûpel ew kir pirtûk  
bi keda ji dilopê xwînê,  
va dibîne cîhan yek yek  
dixwînin vê xweşîkbûnê.  
Leyla Zîlan Arîn Mîrkan  
deriyê navê vê jiyanê,  
ser şopa wa gul vedibin  
dema dimeşin ser wê rê,  
roj hilat dibê ji çavê wan  
bê wan jiyan tarî dibê.

## ROJAVA EZ TÊM!!!!!!

Rojava...  
Bibêje ci çax...  
Tu razayî  
Yan ci çax min hiştiye...  
Tu rakevî  
Yan te hiştiye bê te...  
Ez razêm  
Rojava...  
Nebêje tu kanî?  
Rast e ez ji te dûr bûm  
Lê ...  
Hebûna te...  
Navê te...  
Wêneyen te...  
Rengê te...  
Evîndariya te... Belê  
Her tiştên te  
Mîna meyê  
Di peyala azadiyê de  
Li ser masa şoreşê  
Her dem û dem

Ez dinoşim  
Rojava...  
Pêñûsa min her êvar...  
Kilîla bûkaniyê...  
Ji ser azadiya dêmên te...  
Radike  
Rojava...  
Ramûsana min hilîne  
Nêzik e...  
Nêzik e...  
Ez têm.



**William Blake**  
**Ji Îngîlîzî: Kawa Nemir**

dora serê wê raweşînîn.  
'Giyânî hewayê bi bêhnê  
fêkiyan dermale dibin;  
Û Şadî bi perikên sivik bi  
tolebazî digere li dardora  
Baxan, an jî rûdinê li nava  
daran, ji xwe re distrêne.'  
Wiha strand Payîza rûges, gava  
ku rûniş,  
Paşê rabû, xwe gurc û pêç kir, di  
ser gir û kepezên  
Dilgûvêş re xuricî çû, lê barê  
xwe yê zêrin hişt.



## Weke Gulleyeke ku te nekuje

Berî sala 2014 an  
bidawî bibe berhemek  
nû derbasî bazarê  
bû, Ew jî dîwana  
helbestvan Ciwan Nebî  
ye, bi navnîşana» Weke  
Gulleyeke ku te nekuje». Weke Gulleyeke ku te nekuje berhema sêyemîn e ya helbestvan Ciwan Nebî, pişti «Sar Weke Tîrsî» Sala 2006 an û «Li çepî Xîlmaşîyê» Sala 2010 an.

## Xanîmek Kurd bû sîmaya diravên Iraqê



Wêneyê xanîmek Kurd li ser diravêن ٢٠ hezarî yên Iraqê ye, ew jî nîşana berxwedan û çalakiya jinêne Kurd e di jiyanê de.

Banka Navendî ya Iraqê çapa nû ya diravêن iraqî xiste bazarê, li ser pereyên ٢٠ hezarî jî wêneyê xanimê hatiye danîn, ew jî xanîmek Kurd e û ji qezaya Zaxo ya ser bi bajarê Dihokê ye.

Di wê wêneyê de, xanîma Kurd derdi keve ku kûzkupekî avê li ser milê wê ye, ew wêne jî ji arşivêن kevin ên Zaxo ye. Dîroka wî wêneyî bo ٥ Mijdara sala ١٩٧٧an vedigere, ew wêne li bin pirekê hatiye kişandin, ku niha mizgefta Hecî İbrahîm lê hatiye avakirin, di nav xelkê de jî ew never bi navê Hisêniê navdare.

## Ciwan Nebî û Hekîm Ehmed Henas Li Helbestê Vegerandin



Li nîvîseha ( PDK-S ) ya taxa xerbi şevbuhêrek helbestî

hat lidar xistin tê de herdû helbestvanê Ciwan Nebî û

Gitar amûreke mozikê ya têldar e. Bi geleberî koda wê ji herdû rexan ve pehne û bi ١ têla deng jê der tê ji sê cûreyêن daran tê çêkirin «dara gûla Cûr» ji bo bedena gitarê û «darê Zan» ji bo zendê wê û «dara Tiwê» ji bo pişt û kêleka kodê. Dengê têla ji jér ta jor (mî,sî,sol,rê,la û mî) Têlê gitarê ji naylon yan ji hesin tê çêkirin û li ser zend û ٢ perdê sereke pêk tê.

Tê nasîn bi gelek rengê mozikê wek filamîngo, jazz, blûz. Gitar ne ji kultûra kurdî ye, lê di strana kurdî de baş ev amûr hat bikar anîn, bi taybet di mozika nûjen de mîna stranê Ciwan Haco, Kerem Gerdenserî. Gitar xwedî dengekî bihest e, loma bûye hevalê helbestvanan dema ku ew helbestan dixwînin, û pê re jî guhdar ji stranê ku bi gitarê tê gotin hez dîkin. Forma gitarê ya delal wê kir dostê gelek wênekeşan, di qonaxa ٣٠ salî ve û her zarakan dirâhiştin gitarê û wêneyêن xwe pê re dikşandin, ew jî sedem bûn ku gelek xort

### Sivan Temo

bûne evîndarê gitarê çaxa ku her kes evîndarê tembûrê bû.

#### Amûreya Gitarê Ispaniyan çêkirine.

Ispaniyan amûreya gitarê afrandine, lê dîrok li ser wê nesekinî ye û xepartin û lêkôlin li ser çênebûne û nehatiye şopandin, hinek jêder dibêjin di heyamê «Sequr Qureyîş «de mozikjenê navdar Zeryab çû Endelusê û amûreya xwe «Üd» bixwe re birbû, li wir ew û ûda xwe nûkir kin kir zêde kir pehin kir dibêjin wisa li wir ew staylê Gitarê derketiye, û heta niha gelê Ispanî wê bikar tîn in, mîna tembûrê li nav gelê kurd. Gelek girûpêñ navdar li isbaniya yê bi sazkirina Gitarê hatine nas kîn wek: (Cipsy Kings) Ew malbat di hemû stranê xwe de gitarê bi kar tîn bi şeweyâ»Filamîngo».

**Meqamên mozikê li ser gitarê yêne sereke:**



Ecem, Nehawend, Kurd û Hicaz. Ew bixwe tê nasîn bi du meqaman (Major û Minor), li nebûna nîv bîmol ji gitarê ew hat dûrxistin ji gelek meqamên pêwîst di strana Kurdî de mîna (Seba, Rast, û Beyat).

Gitar bixwe amûreyek harmonî ye, di piraniya stranê cihê xwe digre, û gelek caran ji wek Tembûr û bizq, Keman, û ûdê solo bi kar tîne.

Taybetmendiya Gitarê di dengê akorda wê de ye, akord dengê têla bîhev re ye, guhartina akordan

## Ji şewba ebola o hezar kes mir



Li gorî bîlançoya dawî ya ji aliyê Rêxistina Tenduristîyê ya Cihanê (WHO) ve hat weşandin, ji meha Adarê û vir ve bi gişî ٢٠ hezar ٢٠ kes bi şewba ebola ketine u ji van nexweşan o hezar ٨٩ kesan jiyanâ xwe ji dest dabûn. Ev yek jî nişan dide ku di nava heftiyekê de nêzî ٢٠ kes bi şewbê ketine û ٢٦٩ kesan jiyanâ xwe ji dest dane.

Şewba Ebola ya di meha Adarê de hat tespîtkirin, bi taybeti li welatên Rojavayê Afrîkayê li Lîberya, Sierra Leone û Gîneyê belav bû. Vîrûs ji ber bi xebatkarê tenduristîyê yên biyanî û hin nexweşen hatine van welatân ket, li welatân mîna Spanya û Dewletê

ciqasî bi bajarê xwe ve girêdayî ye, hemû hûrbîniyê bajarê xwe nas dike, ji her tişti hez dike, wisa Ciwan Nebî helbestan xwe yên hemûreg diyarî guhê mîvanan kir.

Paşê Helbestvan Hekîm Ehmed helbest xwendin, Hekîm ji xwe ji êşa Rojava bêpar nehiş, şekrok ji zarokên Kobanê re dabûn hev, heriya Kobanê kir nîvişta xwe, û dilê dilê helbesta xwe diyarî dilê dilê Kobanî kir, û wisa jî Hekîm çend helbestan evînî jî ji haziran re xwend.

## Gitar

hêz û hestan didin awazan. Gitar bêtirî xwe ciwan wê bikar tînin, lê mixabînew bişâşî tê bikar anîn, nexasim ku ew nêzî strana gelerî ya Kurdî dibe, ew şâşıya ku gitarê bikar tîn in wan stranan sar û xav dîkin jîber ku ritm û meqaman diguherin.

Lê de heman demê de gelek hunremendên pispor stranê gelerî ên kurdî bi gitarê xweş kirine, û giyanek nîh dan wan stranan.

Mozika Kurd bi niwê xwe û kevnê xwe zengîn e, lewma derfet ji vê ritma gitarê re vebû ku nûjeniyê têxe mozika kurdî de, wek: Rap, jazz, û Hiphop».

Raste sîsika mozika kurdî tembûre, lê cihê gitarê jî di mozika kurdî de heye, baş e ku nîfiş me yên nû ku xwe fêri vê amûreyê bikin ji bo her çaxa ew di nav tîma mozika kurdî de amade be.

## Ahengek Hunerî Ji Bo Zarokêni Kobanî



Hevgirtina Jinê Kurd-Sûriya şaxê Qamişlo ahengek hunerî ji bo zarokêni Kobanî di bin navê «Zarokêni Kobanî amanet in di sutiyê me de» li nîvîseha hevgirtinê li taxa Aşûriyê bi amedebûna gelek cemaweran ji hemû alîyan û temenan lidar xist. Aheng bi gelek çalakiyên hunerî û çandî destpê kir, zarokan ev çalakî pêşkêş kirin û tê de gelek stran gotin û gelek kom di van çalakiyên de besar bûn.

Di axeftinek taybet de ji bo malpera rojnama «Buyerpress» mamoste Silava Diya Lawîn

## Şêwekarê Navdar Dildar Felemez Pêşengehek Li Navenda Mihemed Sêxo Lidar Xist.



Li navenda Mihemed Şêxo pêşengehek dibin navê «Dest Bi Dest Ji Bo Pêşxistina Çand û Hunerê Li Rojava» hate lidarxistin, tê de tabloyê şêwekar Dildar Felemez hatin pêşkêşkirin.

Di axeftineke taybet de ji bo rojnameya» Buyerpress» Felemez got:» Ev tabloyê min di sala ٢٠١١an hatine çêkirin ji bo ku eşâ welatiyê Sûri bi gişî

## Koma Şano Di Şanogeriyê De Biser Dikeve.



Koma şano pêşengehek bêteng binavê» Jîyan «li çayxaneya Kobanî li taxa Kornîş ya bajarê Qamişlo bi amedebûna gelek cemaweran lidar xist, ew jî bi armanca diyarkirina rola şano di civakê û bidin xuyakirin ku şano çawa pirsgirêkên civakî pêşkêş dike.

Ev pêşengeh ji amedekarî û derhênera Ebdulrehman İbrahim û di daxuyaniyekê taybet ji bo malpera rojnama Buyerpress re memoste İbrahim got: Em koma şano gelekî kêfxweş in bi vê pêşengehek û armanca me ew e ku em şanoja Kurdî lipêş dixin û bilin dîkin».

## Ji Bo Şengal û Kobanî Matşek Fotbolê Li Bajarê

### Hesekê Lidar Ket



Ji bo pişgiriya berxwedana Koban û Şengalê matşek fotbolê li bajarê Hesekê bi amedebûna herdû şandeyen ji Encûmana niştimanî Kurdî li Sûriya û ji Tevgera civaka demokrat (Tev-Dem) ê hat lidarxistin.

Hevbenda werzêşvanen Kurd li Sûriya xuleya çaran ji fotbolê ya zanîngehan

vegerin bi amedebûna gelek cemaweran ji aliyê civakên sîvîl û komîten qutabiyan. Herwiha hemû zanîngeh tê de besar bûn, bi gotina Encûmena Niştimanî ahenegê destpê kir û pişt re gotina (Tev-dem). Hêjayê gotinê ku ev lehengiya fotbolê wê li yaneya Bengo li bajarê Hesekê bê lidarxistin.



## Milyon Dolar 5 Otombêlek bi



Otombêl Mersidêsl SL<sup>100</sup> bi Elmas'ê hatiye xemlandin ku xwediyê wê

kesekî Erebistan a Siûdî ye û buhayê wê otombêlê nêzîkî ° Milyon Dolar in.

Kompnaya Garson ya otombêlan ragihand ku, Emîrê Siûdiyê Welîd Bin Telal ev otombêl kiriye ku cûrê wê Mersidêsl SL<sup>100</sup> e ku tenê û otombêl ji wan hatine çekirin. Wê kompaniyê gotiye: ٢٠٠ Hezar parçeyên Elmas di xemilandina nav û derveyî otombêlê hatiye bi kar anîn û dema ku li Pêşengeha Dubey hat nemaîşkirin merc diyar kir ku her kes bixwaze destê xwe danê ser wê otombêlê divê ١٠٠ Dolarî bide.


## XAÇERÊZ

## Asoyî:

- 1 - Cureyek ji karê rojnamegeriyê.
- 2 - Alozî, alî.
- 3 - Gelekîcîranê Kurdan, oxir be - bi zimanekî biyanî- (vajî).
- 4 - Cinava pirsyariyê ji bo kesan (vajî), tîpêñ ziman (vajî).
- 5 - Bêzehmetî (vajî).
- 6 - Zarokên bi hev re dibin (vajî), ji bo porê (vajî).
- 7 - Lêde (bi zaravê zarakan), rojekê heftiyê.
- 8 - Ewê din (kurtkîrî), navê gulekê.

## Sitûnî:

- 1 - Zimanekî kevn e.
- 2 - Perê kirêci dide (vajî), ji berhemên şîr (vajî).
- 3 - Temen mezin, dengdirêj.
- 4 - Eşandina dîl û zindaniyan.
- 5 - Paşdaçek, hewa, wekhev.
- 6 - Qanûn.
- 7 - Pêxemberek e, êl.
- 8 - Tersî nebûn, na (bi zimanekî biyanî).



EZ Natirsim...!



## Kurdî Xweş e



Hevkêşî	توازن	Teqemenî	متجرات
Dahênan	اختراع	Daberbûn	تعرّض
Encamdan	انجاز	Lihevhatin	اتفاق
Akşaf	اكتشاف	Harç	حارق
Veditin	تخطيط	Sofîner	اعتداء
Pilandan	ريلاند	Zordarî	زورداری

raderbirîn تعبير (عن الرأي)

## Mamik ???

Ji şekir şêrîntir e, ji hesin girantir e  
Ew diçe hundur, gewde dimîne li derive dûr  
Dengbêjekî deng zelal e, ji qewmê xwe re  
neyar e  
Dengbêjekî deng zelal e, ji qewmê xwe re  
neyar e  
Apê min ê rû kur kirî, bi şev û rojê darve  
kirî

^an Bersiva Hejmara  
Mişk – Cemed - xewre/ kolor – melkes - Kevz

## Pend û Şîretên Kurdî


\*Heger ne ji gelaca ba wê gur û mîh bi hev re  
bicêriyana .

\*Heger ne ji çavdînî xelkê baya, wê hinek tazî  
bi rê ketina .

Heger ne fene, ev ci dar û bene

\*Heger gur ji baranê bitirsya, wê ji xwe re  
kurkek çêkiriba .

\*Heger tu aşe , ez qeraş im.



## Zûbêj

Kur kund li gund hişt,  
.gur li gir kuşt



# IBO KAFÉ

مشاهدة جميع المباريات على شاشة سخن اصلي مخصوص ساخنة مخصوص ساخنة مخصوص اصلي مخصوص اصلي

مشروبات ساخنة وباردة اراكيدا و معسل جديدة وللمرة في سوريا حصرياً

مشروبات ساخنة وباردة

طريق عامودا - بجانب معمل البوظ